



DI ŞI'RA KURDÎ YA KLASÎK DE HUNERA MULEMMAYÊ

- Mînakek ji Hevaltiya Zimanan -

(PP 41 - 48)

Abdulhadi TÎMURTAŞ

• Doktora diz iman û belaxeta Erebi de. Zanîngeha Wan Yûzûncü Yilê, Fakulteya Îlahiyatê, Beşa Ziman û

Belaxeta Erebi,

e-mail: atimurtas@yyu.edu.tr. •

Published: 29/10/2020

DOI: <https://doi.org/10.31972/jickpll19.03>

KURTE

Bê guman, hunera mulemmayê mînakek gelek girîng e ji bona têkilî û alîkarî, û beredan û hevaltiya zimanan. Em vê hunerê bi pirranî di helbestên gelên Misilman yê ne Ereb de dibînin. Bi taybetî helbestên klasîk yê Kurdî, Farisî û Tirkî bi vê hunerê hatine xemilandin. Vêca mulemma ne tenê wezîfeyek hûnerî dibîne, di heman demê de wezîfeyek biratiya di neqeba zimanan de jî dibîne. Bi vê hûnerê çend ziman tene cem hev û rengê cuda didine helbestê. Weku din jî ev hûner îmkana danberedan û muqarena zimanan jî diniyasîne. Di edebiyata Kurdî ya klasîk de Melayê Cizîrî, Ehmedê Xanî, Mele Husynê Bateyî, Şêx Ehmedê Nalbend, Seyyid Eliyê Findikî û Şêx Ebdurrahmanê Şawurî di qesîde û helbestên xwe de bi zêdeyî ev huner bikaranîne. Carinan bi du zimanan, carinan bi sê zimanan û carina jî bi çar zimanan hunera mulemmayê bikaranîne. Hêvî dikim ku ev lêkolîn hevaltî û dostaniya van her sisê zimanan derîxîne holê.

Bêjeyên Sereke: Mulemma, Hevaltiya Zimanan, Şiira Kurdî ya Klasîk.

Destpêk

Pêşîyê, pêwîst e ez şîrove bikim ku armanca min bi hunera mulemmayê ne hunera *iqtibasê* ye ya ku tete bikaranîn di zimanê şîir û nesra edebî de. Lewra *iqtibas*, ew e ku tu gotineka meşhûr û bi qîmet weke şî'ir, gotinên pêşîyan, ayet û hedîs bîne, bêxe nav gotina xwe ya şîir an nesrî de û pê şîtexalîya xwe bixemlîn.¹ Mulemma, tiştek dîtir e û ji *iqtibasê* cuda ye. Belê ew jî weke *iqtibasê* hûnerek edebî ya dîtir e û di hêza wê de ye. Wî çaxî mulemma bi awayek din *pir-zimanî* çîye?

Berî em bersiva vê pirsê bidim lazim e em zanibin ku ev huner jîbilî şî'irê, di tu warên dîtir de nehatîye bikaranîn. Melûm e, *iqtibas* çawa di şî'irê de tete bikaranîn wisa di nesrêde jî tete bikaranîn, belê mulemma/*pir-zimanî* taybetiyê bi şî'irê ve ye.

Vêca em werin bersiva pirsê xwe. Di edebiyata Îslamî de ji vî hunerî re *mulemma* tete gotin. Di eslê xwe de *mulemma*, bêjeyek Erebi ye, bi me'na belek, rengareng e² û weke biwêjeki *mulemma* halo tete te'rifkirin: "Mulemma ew şî'ira ku bi çend zimanên ji hev cuda hatîye rêzkirin e." Ji vî karî re telmî' û ji şîirên bi vî hunerî hatîn rêzkirin re jî mulemma'at tete gotin.³

Wekî em li şî'irên bi vî terzî hatîn rêzkirin mêze dikin em dibînin wê bi çend awayî ne: Hinek ji wan malîkek bi zimanekî ye û malîka dîtir bi zimanekî dîtir e, carna, ji her çar malîkan malîkek bi zimanekî cudayî ye, carna jî hindiktir û carna jî zehftir e. Exlebê

Bnr. Curcanî, Seyyid Şerîf Elî b. Muhammed, *et-Te'rifat*, Metbea Es'ed Efendi, Stenbol, 1300, rp. 22. ¹

Bnr. İbn Menzûr, *Lisanu'l-'Ereb*, Daru İhyai't-Turasi'l-'Erebî, Beyrût, 1995, XII, 329²

Bnr. Pala, İskender, *Ansiklopedik Divan Şiiri Sözlüğü*, Weşanên Akçağ, Ankara, 1989, rp. 369.³



mulemmeatan bi du zimanan in. Belê yê bi sê zimanan û bi çar zimanan jî hene. Çendî ku Îskender Pala, mulemmeatên bi sê zimanan hatî nêzîkirin zehf kêr in bibe jî û mulemmatan di sê zimanan de Tirkî, Erebî û Farisî hesir bike jî belê haya wî jî edebîyata Kurdî nîne, an jî haya wî heye belê nexwestîye dîyar bike. Lewra va ye di edebîyata Kurdî de, ne mulemmeata bi sê zimanî, ya bi çar zimanî jî heye. Weke ku emê di mînaka Ehmed Xanî de bidine nîşandan.

Berî ku em mînakê vê hunera xerîb pêşkêşî we bikin divê em binêrin ka ev hûner ji kû deverê hatîye û binyata wê di kî zimanî an zimanan de heye. Tiştê ku ez jê haydarim ewe ku ev hûner di edebîyata Erebî ya kevin de tune ye, hebe jî ez liqayî nehatime û min nebihîstîye. Belê ev tiştê dîyar e ku ev hunerek taybetîye bi edebiyata Îslamî ya Rojhilat ve ye û di edebiyata Rojava de ne hatîye bikaranîn û naskirin li gor pirs û ger û lêkolîna min.

Haya min ji Edebîyata Ordî û Hindî tune ye, belê ez wisa texmîn dikim ku ev hûner di van her du edebiyatan de jî hene. Lêbelê ev hûner di Edebîyata Farisî, Tirkî û Kurdî de tiştê sabit û berçav e. Bê guman ev hûner digel ku metnên qesîdeyan dixemilîne û zîba dike, di heman demê de hevaltî û biratiya zimanan jî dide xuyakirin. Bi vê wesîleyê em karin çend ziman û çend edebiyatan bidine berhev û miqayesa wan bikin. Ev jî wezîfeyê geleng girînge, hem jibo xwendevanan û hem jî jibo têgihaştina qîmet û bihayê wan edebiyat û zimanan.

Weke ku ji pirs û lêkolînan hatî fêhmê ev hûner serê pêşî di edebiyata Farisî de di qernê dehan de derketîye holê û ji Farisî derbasî edebiyatên zimanên din yê li Rojhilatê bûye.⁴ Heke ku em bixwazin mînakên vê hûnerê di van zimanan tevan de bidin, dê nivîsa me gelek dirêj bibe. Bo veyekê emê îşaretê bal cihê wan mînakan bikin û dûvre li rastîya vê hûnerê di Edebîyata Kurdî de bigerihîn û bi mînakên zaravayê Kurdiya Kurmancî iktifa bikin.

a- Di Erebî de

Di edebiyata Erebî de hunera mulemmayê bi me'neya ku derbas bûyî xuya nake û di çavkaniyên belağeta Erebî yê kevne de jî em liqayî tuwî mînakan nabin. Belê di mebesta cînasê de, behsa cînasa mulemme' tête kirin ku ew jî ewe ku di nezmekî de kelimeyên beytekî bi nuqte bin û kelîmeyê beyta din bê nuqte bin, an jî kelîmeyê mîsrayekî bi nuqte bin û kelîmeyê mîsraya din bê nuqte bin.⁵ Di destpêka qernê bîstan de cureyek nezm derket ku her çiqasî hindik jî be em karin bîxînin di bin te'rîfa mulemmayê de, ew jî ew e ku mîsrayek bi Erebîya fesîh be û mîsraya din bi Erebîya amî be.⁶

Vêca wisa xuyaye ku di edebiyata Erebî de hunera mulemmayê hunerek nûderketîye û heya vê gavê jî bi awayek zanistî nehatiye qebûlîkirin,⁷ mînakên heyîn jî di nav edebiyata folklorîk de an jî di şî'ra amî de xuya dikin.⁸

b-Di Farisî de

Bêguman edebîyata Farisî edebîyatek dewlemend û serbixwe ye. Di dîrokê de hukum li edebîyata rojhilat kirîye. Zehf şair û hunermendên milletên rojhilat digel ku ne Farisî bûne jî

Bnr. Bekki, Salahaddin, "Âşık Tarzı Şiir Geleneğinde Mulemma", *I. Uluslararası Âşık Sümmani ve Âşıklık 4 Geleneği Sempozyumu Bildirileri*, hzl., Abdülkadir Erkal, Birleşik Yayınevi, Ankara, 2012, rp. 487, (485-500).
'Ekkawî, 'In'am, *el-Mu'cemu'l-Mufessel fi 'Ulûmi'l-Belaxe*, Daru'l-Kutubi'l-İlmiyye, Beyrût, 1992, rp. 523;⁵
Ya'qûb, İmîl Bedî, *el-Mu'cemu'l-Mufessel fi 'İlmi'l-'Arûd we'l-Qafiyeye we Funûni'ş-Şi'r*, Daru'l-Kutubi'l-İlmiyye, Beyrût, 1991, rp. 294-295.

Qehremanî, 'Elî, "Ensebu'l-Ewzan we Ecmeluha fi'ş-Şi'ri'l-Mulemme'",⁶
<http://www.alfaseeh.com/vb/showthread.php?t=51356>, (10.09.2019)

Bnr. Qehremanî, Elî Esxer, "Fennu'l-Mulemme' "Heleqetu'l-Wesl Beyne'ş-Şi'reyn el-'Erebî we'l-Farisî'",⁷
Mecelletu Dîrasat fi'l-Luxeti'l-Erebîyye we Adabiha, Hejmar: 6, 2011, rp. 80, (77-100)

Ji bo hunera mulemmayê di edebiyata Erebî de û mînakên wê yê di folklor û di şî'ra 'amî de bnr: ed-Dağûqî,⁸
İbrahîm, "el-Mulemme'at", *et-Turasu'ş-Şa'bi*, Sal: 1, Hejmar: 3, Bexdad, 1963, rp. 321-327, (321-329).



belê şûna ku hunerê xwe bi zimanê xweyê taybetî bidine nîşandan bi Farisî dane nîşandan û weharenge alim, dîrokvan û hunermendan berhemên xwe yên ilmî jî bi Farisî nivîsandine. Hunera mulemma cihê xwe di edebîyata Farisî de girtiye. Heta em karin bêjin ku maka vê hunerê edebiyata Farisî ye. Di edebiyata Farisî de kesê yekem car behsa hunera mulemmayê kirî Muhemmed bin Umer er-Raduyanî (w. 1088)⁹ û Reşîduddîn el-Watwat (w. 1177)¹⁰ tê hesabê. Di edebiyata Farisî de kevintirîn mînak hunera mulemmayê ya gihatiye me qesîdeyên Şehîd el-Belxî (w. 937) ne.¹¹ Piştî Şehîd el-Belxî, Mewlana Celaleddînê Romî (w. 1150) di *Mesnewîyata* xwe de ev huner bikaranîye, Mewlana Mela Camî (w. 1486) û Se'dîyê Şîrazî (w. 1292) û Hafîzê Şîrazî (w. 1390) jî ev huner bikaranîne.¹² Evan şî'irên xwe bi Tirkî û bi Erebbî xemilandine belê berê xwe nedane Kurdî.

c-Di Tirkî de

Bi rastî yek karê bêje di dewra Osmanîyan de û di dewra Selçuqîyan de edebîyata Tirkî hatîye ihmalkirin û çî hikmete nizanî edebiyata Farisî hatiye tercîhkirin. Belê cardî jî şairin derketine û edebiyata Tirkî ji mirînê xilaskirine, dane jîyandan û vejandine, weke Yûnus Emre (w. 1320), Fuzulî (w.1556) û hwd.

Fuzulî di dîwana xwe de ev hunera edebî bi hostayî bikaranîye û mulemmeatên xwe bi Tirkî û Erebbî û Farisî rêzkirine. Di heman demê de di mesnewiya xwe ya bi navê *Leylî û Mecnûn* de, di pîrr ciyan de ev huner bikraniye.¹³ Wehareng e Elî Çelebiyê ku bi mexelsa Qinalizade (w. 1572) meşhûr e jî qesîdeyek di derbareyê pesnê pêxember Muhemmed (s.) de nezm kiriye. Qesîde ji 63 beytan pêk tê û sê kûşe ye. Ji her sê beytan beyta yekem bi Erebbî ye, ya duyem bi Farisî ye û ya sêyem bi Tirkî ye.¹⁴

c-Di Kurdî de

Awayê ku mulemma/pir-zimanî di şî'ira Kurdî de cihgirtî û belav bûyî di tu edebîyatên dîtir de cih negirtîye. Tu kîjan dîwana Kurdî veke, çî kevin çî nû tu dinêrî wê ev huner bikaranîye. Belê tu karê çend hebên weke Feqîyê Teyran (w. 1640) ji vê derxîne. Wekî din, şairên Kurd, mulemmeat kafi nedîtine rabûne di nav helbestên xwe de zehf qesîde xwerû bi zimanên dîtir nivîsandine. Hinek rabûne dîwanek xwerû bi zimanek dîtir nivîsandine. Bi rastî ev dide nîşandan ku Kurd di eslê xwe de tebîet nezm in. Lewra tu li kîjan Kurdê ku destê wî qelem girtî mêze bikî tu dinêrî wî şîir nivîsîye. Heta di nav Kurdan de şairek heye bi şêş zimanî helbest nivîsandiye, navê wî Şukrî Bitlîsî ye.¹⁵ Bêweku ev di nav milletên dîtir de bûye derbûmesel ku hinek weke Ereban gotine "Kurd hê di zikê dayîka xwe de şair tene dinyayê". Vêca emê hunera mulemmayê di helbestên çend şairên Kurd yên klasîk tene hesabê pêşkêş bikin.

a- Melayê Cizîrî

Mele Ehmedê Cizîrî (w. 1640) yê ku bi navê Melayê Cizîrî meşhûr e, di qesîda bi navê "Mela Me Li Gerdana Dilber" de Kurdî û Erebbî bikaranîye. Di qesîda bi navê "Min Di Ber

er-Raduyanî, Muhemmed bin 'Umer, *Tercumanu'l-Belaxe*, Şerîketê Întîsarâtê Esatîr, Tehran, 1362, rp. 107-108.

el-Watwat, Reşîduddîn, *Heda'iqu's-Sihr fi Deqa'iqi's-Şi'r*, (Tarîb, İbrahîm Emîn eş-Şewarîbî) Matbaatu Lecneti't-Telif we't-Tercume, Kahire, 1945, rp. 163.

Bnr. er-Raduyanî, *Tercumanu'l-Belaxe*, rp. 107.¹¹

Bnr. Pala, İskender, *Ansiklopedik Divan Şiiri Sözlüğü*, rp. 369; Qehremanî, "Fennu'l-Mulemme", rp. 84; ¹²

Qindîl, İs'ad Ebdulhadî, *Funûnu's-Şi'ri'l-Farisî*, Daru'l-Endelus, Beyrut, 1981, rp. 372-376.

Bnr. Fuzulî, *Fuzûlinin Divanı*, (Amedeyîya Kenan Akyüz û hevalên wî), Weşanên Akçağ, Ankara, 1990, rp. 149, 158, 244, 256. ¹³

Ji bo metna vê qesîdeyê bnr. Aksoy, Hasan, "Kınalızade Ali Çelebi ve Mulemma' Na'tı", *Marmara Üniversitesi İlahiyat Fakültesi, Dergisi*, Hejmar: 5-6, İstanbul, 1993, (125-144) ¹⁴

Bnr. Adak, Abdurrahman, "Altı Dilde Şiir Yazan Bir Şair: Şükri-i Bitlîsî", *I. Uluslararası Dünden Bu Güne Tatvan ve Çevresi Sempozyumu Bildirileri*, Weşanên Beyan, İstanbul, 2008, rp. 673-690. ¹⁵



Qalûbela” de Kurdî, Erebi û Farisî bikaranî ye.¹⁶ Di qesîda bi navê “Husna (Ehsenu’-Teqwîm)” de di her beytê de malika pêşî Kurdî ye û malika diduyan bi Erebi ye.¹⁷ Qesîda bi navê “Ya Ramîye Qelbî” xwerû bi Erebi ye û yek ziman e.¹⁸ Wekî dîtir di zehf qesîdeyan de cih cihan de cardin em liqayî malikên wan beytnên Erebi tên.

Mînakek ji mulemmaya Kurdî û Erebi:

Dil bendê dama zulfekî keftî kemenda ulfekî

*Hel fî yedî’l-meftûni şey ew keyfe esne ‘ ya feta*¹⁹

Nisbet perî zîba ye ew, wek nêrgiza yekta ye ew

*Ya men rea xillî fe hel yuşbî bi şey’in qameta*²⁰

Me j’buxçeya yar ziynetê, bêpirs Melê destek çitê

*We bi ma ceneytu ceneyetî elqet ‘eleyye cînayeta*²¹

Mînakek ji mulemmaya Kurdî, Farisî û Erebi:

Mîn di ber (qalûbela) batin vi wêra bû evin

Hêj li ser ehda (elestum) ta bi roja axirîn

Min divê lê eşkerakim carekê daxa nihîn

*Guftem ora ma dia goy tu em ey hûrieyn*²²

E’redet ‘ennî we qalet: ma du ‘au’l-kafirîn^{23, 24}

b- Ehmedê Xanî

Ehmed Xanî cihek cudayî di edebîyata Kurdî de girtîye. Ew bi xwe tenê ne bi şîir û edebîyatê ve mijulbûye, bi fikr, sîyaset, dîn, perwerdehî û civakê ve jî eleqedar bûye. Ji lew ew xwedîyê şexsiyetek rengîn e. Em vê rengîntîya wî çawa di mijarê helbest û mebastên wî de dibînin em di zimanê helbestên wî de jî dibînin. Ev tişteke xwuyayî ye hewceyî isbatê nîne. Çavnêrînek sere sere li helbestên wî besî hînbûna vê rastîyê ye. Xanî, diwana xwe bi çar zimanan xemilandîye: Kurdî, Tirkî, Farisî û Erebi. Qesîdeyek wî xwerû bi Tirkî heye²⁵, qesîdeyek jî Kurdî, Erebi heye²⁶ û qesîdeyek jî bi Kurdî, Tirkî, Farisî û Erebi heye. Emê vê qesîdeyê bi temamî li xarê bi cih bikin û malikên ku ne Kurdîne wergerênin Kurdî. Xanî bi awayek balkêş pênc qesîdeyên xwe bi hunera mulemmayê xemilandine. Xanî di dawîya qesîdeya bi navê “Ey Wahidê Penhan” de malikek bi Kurdî û malikek bi Erebi bikaraniye û wiha gotiye:

Ew jî bi metaê xwe qumaşê te dixazit

(Subhaneke len tu’yîse min rûhike ebda)

Ehmed ji senaya te nîda ket qe çû wesfa

(Ma e’cezenî hemduke en ehmede hemda)²⁷

Wekî din em hunera mulemma yê cih û cih di Nûbihara Biçûkan de jî li bal Xanî

dibînin. Baxusus di beşa Behra Muteqarib de ya ku beşa dawîyê ye di pirtûkê da. Belê ev di şiklê ku malika duduyan wergera malika yekan de ye. Mesela Xanî halo dibêje:

Bnr. Cizîrî, Mele Ehmed, *Diwana Melayê Cizîrî*, (Berhevkirina Tehsîn İbrahim Doskî), Weşanên Hukumeta¹⁶ Herêma Kurdîstana Iraqê, Wezareta Rewşenbîrî, Dihok, 2000, rp. 192-194.

Bnr. Cizîrî, *Diwan*, rp. 260-262.¹⁷

Bnr. Cizîrî, *Diwan*, rp. 271.¹⁸

Ma çî ji destê meftûnê işqê tê? Ma karim çî bikim ey cuwan?¹⁹

Ey ew kesên dostê min dîtî! (ka bêjin) ma tişteke mîna bejna wî heye?²⁰

Ji ber yeka tenê ya ku min jê kirî, ez suçdar kirim.²¹

Min jê re got ku em ji te re dua dikin ey horîeyn.²²

Berê xwe j imin zivirand û got: Dia kafiran çîye?²³

Cizîrî, *Diwan*, rp. 193.²⁴

Doskî, Tahsîn İbrahim, *Cewahiru’l-Me’ânî Fi Şerhi Diwani Ehmed el-Xanî*, Daru Sipirêz, Erbîl, 2005, rp. 25 172-178.

Doskî, *Cewahiru’l-Me’ânî Fi Şerhi Diwani Ehmed el-Xanî*, rp. 72-83²⁶

Ehmedê Xanî, *Diwana Ehmedê Xanî*, (Berhevkirina Tehsîn İbrahim Doskî), Sipirêz, Dihok, 2016, rp. 16.²⁷



Fema xetbukum eyyuhelmurselûn

Gelî qasidan bo çi hatine hûn.

Linezheb we nel'eb we ne'kul mean

Biçin da bileyzîn bi vêkra bixwun²⁸

Jibilî van jî Xanî Nûbihara xwe bi şeş malikên bi Erebi bi xemlek balkêş qedandîye.²⁹

Mulemmaya Ehmedê Xanî ya Bi Çar Zimanî

Xanî qesîdeya xwe ya bi navûdeng ya çar koşe bi çar zimanî nivisandîye û tevde bi

behra remel rêzkirine. Ji çar malikan her malikek bi zimanekî ye. Malika pêşî bi Erebi ye, ya

duduyan bi Farsî ye, ya sisêyan bi Tirkî ye û ya çaran bi Kurdî ye. Temamê Qesîde eve:

فات عمري في هواك يا حبيبي كل حال³⁰

آه ونالم همدم شد در فراقت ماه وصال³¹

Ger benim kanim dilersen çoktan olmuştur helal³²

Mest û serxweş im ji işqê min nema eql û kemal

أنت فكري في فؤادي أنت روعي في الجسد³³

لشكري غمهاى تو ملك دلم ويران كرد³⁴

Dade geldim aşk elinden isterim senden meded³⁵

Van Tetaran kirne talan eql û dîn û milk û mal

طال غمي, زاد همي, شاع سري في الملا³⁶

تشنه ئى جامى وصالم جون شهيد كرىلا³⁷

Yoksa sen divane oldun nice halin ey dila³⁸

Yan ji nûve eşweyek da min hebîba çav xezal

بت مهجورا حبيبي لست مني عالما³⁹

مردم از درد فراقت غافلئ از حالئ من⁴⁰

Can û dilden arz kildim halimi canane ben⁴¹

Erzê hala min tu xafil qet nepirsî erzihal

هل لنا من نعمة الوصل حبيبي من نصيب⁴²

أفتادم بر درت بئ جاره سر كردان غريب⁴³

Derdimin çok olduğundan ona yoktur hiç tabip⁴⁴

Xanî, Ehmed, *Nûbihar*, Metbea Ehmed Kamil, Stenbol, 1323, rp. 36.²⁸

Xanî, *Nûbihar*, rp. 37.²⁹

Umrê min di işqa te de derbas bû ey dost! her dem.³⁰

Ji firqeta te, ah û nalînên min bi meh û salan di dome.³¹

Heke te xwîna min bive ew zûde bûye helal.³²

Tu fikra minî di dilê min de, rihê minî di cesed de.³³

Leşkerê derdên te, dinya dilê min wêran kir.³⁴

Ji destê işqê hatime edaletê, hewara xwe didime te.³⁵

Hizna min dirêj bû, derdê min zêde bû û sirrê min belav bû.³⁶

Mîna şehîdê Kerbelayê tîyê visala te me.³⁷

An tu dîn bûyî, ev çi hale ey dil!³⁸

Şeva xwe bê kes derbas kirim, haya te ji min nîne ey dost!³⁹

Ez ji firqeta te mirîme. Belê te haj min nîne.⁴⁰

Ji can û dil min erza halê xwe ji evîna xwe re kir.⁴¹

Ma wê nimeta wîsalê bigihe me jî ey dost!⁴²

Xerib, perişan û bêçare ketime ber derîye te.⁴³

Hingî derdê min zehfîn nîne jêre tebîb.⁴⁴



Ey Tebîbê min dewayê derdê Xanî her wisal⁴⁵

c- Mele Huseynê Bateyî

Melayê Bateyî (w. 1750) di qesîda bi navê “Ey Ne‘tê Tu Ez Erşî Heta Ferşî Şehîra” ya di derbarê pesnê Peyxember (s.) de her du malik ji şeş malikan bi Erebi ye yê dîtir bi Kurdî ne.⁴⁶

d- Şêx Ehmedê Feqîr

Şêx Ehmedê Feqîr (w. derdora 1840) jî di dîwana xwe de ev huner bi hostayî bikaraniye û gelek qesîdeyên xwe bi Kurdî, Farisî û Erebi xemilandine. Ewî di derbareyê işq û şewqa Pêxember (s.) de qesîdeyek nivî bi Kurdî û nivî bi Farisî nezm kiriye.⁴⁷ Her wiha ewî qesîdeyek nivî Kurdî û nivî Erebi jî heye.⁴⁸ Ji bilî qesîdeyên mulemma dîwana Şêx Ehmedê Feqîr ji sê pişkan pêk hatiye: Pişka Kurdî, Pişka Erebi û Pişka Farisî, ango ewî bi sê zimanan helbest nivîsandine.

e- Seyyid Eliyê Findikî

*Seyyid Eliyê Findikî (w. 1968) jî di hinek qesîdeyên xwe de ev huner bikaraniye û ewî jî cih û cihan bi Kurdî û bi Erebi nivîsandîye. Bo mînakê qesîda bi hijmara 7 de beyta pêşî bi Erebi ye û yê mayîn bi Kurdî ne. Ew wisa dibêje:

⁴⁹*Ela eyyuhe 'lixwanu ma lî? * feqad male ile 'l-hicranî qelbî.*

Ji vî qasî gelek ketme ecêbê * ku hinde dil ji hubbê maye xalî⁵⁰

Qesîda Findikî ya bi hijmara 13 û ya bi hijmara 47 xwerû bi Erebi ne.⁵¹

f- Şêx Ebdurrehmanê Şawurî

Şêx Ebdurrehmanê Şawurî (w. 1974), di dîwana xwe da sê qesîdeyên mulemma hene; yek bi navê “Ya Ehmedê Şemsa Şehîr” e ya ku di derbarê pesnê Peyxemberî da ye. Yek jî bi navê “Cuztu'l-Erbeîn” û ya sisîyan jî bi navê “Şumûsu'l-Esrî Xabû” ye.⁵²

Mînakek ji mulemmeatên Şawurî ev e:

Cuztelerbeîn exezte fecce'l-mucrimîn * La texfa elellah⁵³

Ferrette fe efrette reîse'l-muxlifîn * Qul estexfirullah⁵⁴

We'da te serê subhê ku bestê naçî êvar * Ey ehmeqê xêrxewar

Cehda te di gubhan wekî morê bûye işkar * Qul estexfirullah

Kullu'n-nasi yexdû mûbiqû ew mu'tiqû'n-nefsi * Sahi ixtenim xems⁵⁵, ⁵⁶

Minakeke din jî ev e:

Ya seyyidê kullê enbiya mesken Medine

Enwarê te der erd û semaî kemmilîne

Doski, *Cewahiru'l-Meânî Fi Şerhi Diwani Ehmed el-Xanî*, rp. 220.⁴⁵

Tehsîn İbrahim Doskî û Muhsin Doskî, *Melayê Bateyî Jîyan û Berhem*, Weşanên Sipîrêz Hewlêr, 2005, rp. 46
125-128.

Ehmedê Feqîr, *Dîwana Şêx Ehmedê Feqîr*, (Berhevkirina Tehsîn İbrahim Doskî), Ekdîmiya Kurdî, Hewlêr, 47
2017, rp. 273-274.

Feqîr, *Dîwan*, rp. 80-81.⁴⁸

Gelî hevalan! Ma çî bûye ji min? Dilê min ber hicranê ve çûye.⁴⁹

Bnr. Findikî, Seyyid Eli, *Diwan*, Amedeyîya (Selman Dilovan), Weşanên Nûbihar, Stenbol, 2000, rp. 52.⁵⁰

Findikî, *Dîwan*, rp. 96, 272.⁵¹

Bnr. Şawurî, Şex Ebdurrehman, *Dîwan*, (Amedeyîya Muhemmed Muxlis Şawurî), Weşanên Nûbihar, 52
Sitenbol, 2013, rp. 25-26, 125-127, 181-184.

Umrê te ji çilî bûrî, te rêya gunehkaran girtiye. Ev ji Xwedê xef nabe.⁵³

Tu ji heddê xwe dergetî te zêdegavî avêtin ey serokê nesozdaran! Bêje estexfirullah.⁵⁴

Her mirov, serê sibehan an nefsa xwe dike köle an jî azad dike. Hevalo! Qedrê pênc tiştan zanibe.⁵⁵

Şawurî, *Dîwan*, rp. 125.⁵⁶



(Qed kunte nebiyyen qeble Ademe min sinîne)⁵⁷
Eflakê bedîû's-sun'i seb te xuluqîne
(Şukren leke) ya Rebbî ummeta wî Ehmedî ne
(Ma ursilte illa rehmeten lil'alemîne)^{58, 59}
Wekî din nîvê qesideyên diwana Şawurî Erebi ne û nîvî Kurdî ne.

g- Şêx Muşerrefê Xunûkî

Şêx Muşerrefê Xunûkî (w. 2008) jî ji şairên Kurdên klasîk yê ku bi çend zimanan helbest nivîsandî ye. Ewî di dîwana xwe de digel helbestên Kurdî, helbestên xwerû Erebi⁶⁰, Farisî⁶¹ û Tirkî⁶² nivîsandine. Digel vê ewî gelek qesîdeyên xwe yê Kurdî bi hunera mulemmayê xemilandine. Ewî beyt an jî malikên Erebi û Farisî di nav qesîdeyên xwe de bi hostayî bi cih kirine.⁶³ Xunûkî di bikaranîna hunera mulemmayê de xwe weke pisporek nîşan dide.⁶⁴

Mînakek ji mulemayên Xunûkî:
Ya Eba Selman Suleyman ey bira û ey çira
Bo çî mektûban birê nakî ji bo dostan çira?
Hel tera înnî erakum qeble mewtî hel tera?⁶⁵
Yan evan derd û xeman dê bibne qebrê bi xwe ra
Ah! Ser û patêk helan ji vê firqetê ah firqetê!⁶⁶

Encam

Di netîcê de, Edebîyata Kurdî bi tu miqamî û di tu warî de ji edebîyatên zimanên Rojhilatê kêr nemaye û ji wan paş jî nemaye. Bi rastî heke em bi çavê insafê binêrin em karin bêjin peşîvanti kirî ye û her xwe nû kirîye. Ev mînakên me di vê xebata xwe ya mutewazî de dayîn rastîya vê gotina me didine nîşandin. Vêca ez bi bawer im heke ku em îro çand û edebîyata Kurdî ji binaxê derîxînin, bi aveka zelal bişûn, lêkolînên akademîk li ser bikin dê cewherên zehf biha derkevîne holê. Vêca piştî ku Edebiyata Kurdî kete rê û di nav edebiyata cîhanê de cihê xwe girt û pê de her pêşde diçe û bi edebiyatên cîran re pêşbazî û reqabetê dike. Di vê mînaka hunera mulemmayê de me dît ku edebiyata Kurdî çawa kariye bi edebiyatên cîran re pêşbaziye bike.

Çavkanî

- 'Ekkawî, 'In'am, *el-Mu'cemu'l-Mufessel fi 'Ulûmi'l-Belaxe*, Daru'l-Kutubi'l-İlmiyye, Beyrût, 1992.
Adak, Abdurrahman, "Altı Dilde Şiir Yazan Bir Şair: Şükri-i Bitlisi", *I. Uluslararası Dünden Bu Güne Tatvan ve Çevresi Sempozyumu Bildirileri*, Weşanên Beyan, İstanbul, 2008, (673-690).
Aksoy, Hasan, "Kınalızade Ali Çelebi ve Mülümme' Na'tı", *Marmara Üniversitesi İlahiyat Fakültesi, Dergisi*, Hejmar: 5-6, İstanbul, 1993, (125-144)
Bekki, Salahaddin, "Âşık Tarzı Şiir Geleneğinde Mülümme", *I. Uluslararası Âşık Sümmâni ve Âşıklık Geleneği Sempozyumu Bildirileri*, (Amedeyiya Abdülkadir Erkal), Weşanên Birleşik Ankara, 2012, (485-500).
Cizîrî, Mele Ehmed, *Diwana Melayê Cizîrî*, (Berhevkirina Tehsîn İbrahim Doskî), Weşanên Hukumeta Herêma Kurdistana Iraqê, Wezaretê Rewşenbîrî, Dihok, 2000.

Tu berî Adem bi salan pêxember bûyî.⁵⁷

Tu tenê jibo bibî rehmet ji alemê re hatî şiyandin. ⁵⁸

Şawurî, *Dîwan*, rp. 13-14.⁵⁹

Bnr. Xunûkî, Şêx Muşerref, *Şêx Muşerrefê Xunûkî û Şairên Malbata wî*, (Amedekirina Xalid Sadînî û Tehsîn ⁶⁰ Doskî), Wezaretê Rewşenbîrî û Lawan, Dihok, 2013, rp. 177-181.

Xunûkî, *Dîwan*, rp. 83, 144-147, 159, 164, 170, 171, ⁶¹

Xunûkî, *Dîwan*, rp. 108.⁶²

Xunûkî, *Dîwan*, rp. 58, 69, 74, 127, 140, 175.⁶³

Sönmez, Nesim, *Diwana Şêx Muşerrefê Xunûkî Metn û Lêkolîn*, Weşanên Seyda, Diyarbekir, 2018, rp. 19.⁶⁴

Eceba ma ka ezê berî mirinê we bibînim eceba!⁶⁵

Sönmez, *Diwana Şêx Muşerrefê Xunûkî*, rp. 280.⁶⁶



- Curcanî**, Seyyid Şerîf Elî b. Muhammed, *et-Te'rifat*, Metbea Es'ed Efendi, Stenbol, 1300.
- Doskî**, Tahsin İbrahim, *Cewahiru'l-Me'ânî Fi Şerhi Diwani Ehmed el-Xanî*, Daru Sipirêz, Erbil, 2005.
- ed-Dağûqî**, İbrahim, "el-Mulemme'at", *et-Turasu's-Sa'bi*, Sal: 1, Hejmar: 3, Bexdad, 1963, (321-329).
- Doskî**, Tehsin İbrahim û Doskî, Muhsin, *Melayê Bateyî Jîyan û Berhem*, Weşanên Sipirêz Hewlêr, 2005.
- Feqîr**, Ehmed, *Dîwana Şêx Ehmedê Feqîr*, (Berhevkirina Tehsin İbrahim Doskî), Ekadîmiya Kurdî, Hewlêr, 2017.
- Findikî**, Seyyid Eli, *Diwan*, Amedeyîya (Selman Dilovan), Weşanên Nûbihar, Stenbol, 2000.
- Fuzulî**, *Fuzûlînin Divanı*, (Amedeyîya Kenan Akyüz û hevalên wî), Weşanên Akçağ, Ankara, 1990, (244, 256).
- İbn Menzûr**, *Lisanu'l-'Ereb*, Daru İhyai't-Turasi'l-'Erebî, Beyrût, 1995.
- Pala**, İskender, *Ansiklopedik Divan Şiiri Sözlüğü*, Weşanên Akçağ, Ankara, 1989.
- Qehremanî**, 'Elî, "Ensebu'l-Ewzan we Ecmeluha fi's-Şi'ri'l-Mulemme'",
<http://www.alfaseeh.com/vb/showthread.php?t=51356>, (10.09.2019)
- Qehremanî**, Elî Esxer, "Fennu'l-Mulemme' "Heleqetu'l-Wesl Beyne's-Şi'reyn el-'Erebî we'l-Farisî", *Mecelletu Dirasat fi'l-Luxeti'l-Erebiyye we Adabiha*, Hejmar: 6, 2011, (77-100)
- Qindîl**, İsa'ad Ebdulhadî, *Funûnu's-Şi'ri'l-Farisî*, Daru'l-Endelus, Beyrut, 1981.
- er-Raduyanî**, Muhammed bin 'Umer, *Tercumanu'l-Belaxe*, Şeriketê İntisaratê Esatîr, Tehran, 1362.
- Sönmez**, Nesîm, *Dîwana Şêx Muşerrefê Xunûkî Metn û Lêkolîn*, Weşanên Seyda, Diyarbekir, 2018.
- Şawurî**, Şex Ebdurrehman, *Dîwan*, (Amedeyîya Muhammed Muxlis Şawurî), Weşanên Nûbihar, Sitenbol, 2013.
- Xanî**, Ehmed, *Dîwana Ehmedê Xanî*, (Berhevkirina Tehsin İbrahim Doskî), Sipirêz, Dihok, 2016.
- Xanî**, Ehmed, *Nûbihar*, Metbea Ehmed Kamil, Stenbol, 1323.
- Xunûkî**, Şêx Muşerref, *Şêx Muşerrefê Xunûkî û Şairên Malbata wî*, (Amedekirina Xalid Sadînî û Tehsin Doskî), Wezareta Rewşenbîrî û Lawan, Dihok, 2013.
- el-Watwat**, Reşîduddîn, *Heda'iqu's-Sihr fi Deqa'iqi's-Şi'r*, (Tarîb, İbrahim Emîn eş-Şewaribî) Matbaatu Lecneti't-Telif we't-Tercume, Kahire, 1945.
- Ya'qûb**, İmîl Bedî', *el-Mu'cemu'l-Mufessel fi 'İlmi'l-'Arûd we'l-Qafiye we Funûni's-Şi'r*, Daru'l-Kutubi'l-İlmiyye, Beyrût, 1991.

THE ART OF MOLAMMA İN CLASSİCAL KURDİSH POETRY

- An Example of Language Friendship –

Of course, the art of molamma is a very important example of communication and assistance, and of language skills and friendships. We often find this art in the poems of non-Arab Muslim peoples. The classical poems of Kurdish, Persian and Turkish are especially decorated with this art. Molamma art not only serves as an art, but also as a brotherhood between languages. With this art several languages come together and give the poem a different color. Similarly, this art recognizes the possibility of statements and references to languages. In classical Kurdish literature, Melayê Cizîrî, Ahmedê Khanî, Mele Hussein Bateyî, Shaykh Ahmad Nalbend, Seyyid Elî Findikî, and Shaykh Abdurrahman Shawouri make more use of this art in his poems and poems. The Kurdish poet uses the art of molamma, sometimes in two languages, sometimes in three languages and sometimes in four languages. I hope this study reveals the friendship and friendship of all three languages.

Key Words: Molamma, Friendship of Languages, Classical Kurdish Literature.